

## Pira Gindêhere (Cendere)

Dennis Dargul

Li Kurdistanê hejmerek pîreyan hene ku ji layanê hendesî ve wek yêkin. Hema hema kopiye yêkin ji layanê bikaranina amîran ve bigre heta dirêjahî û panetiya wan wek hevîn. Gelek gotûbêj li ser van pîreyan hene. Taybet çîrokên mîtolojîk, dişîbin hev û din. Dema kurd qala çîrokên xwe dikin, bes keçên xwe dikin qûrbanê wan pîreyane. Lê dema bi şewazeke zanistî em ser dîskînîn: Desthilatdaran ji bo keçên xwe ango xatûnên xwe, ev pîreyane avakirine ango bi meremên leşkerî durist kirine. Lê navê keç ango jinên xwe li van Pîreyan kirine.




Pîreya Gindere: Li Bakurê Kurdistan Navçeya Kolik (Kehta) ya Semsurê ye. Yêk ji pîreyên herî kevin yê cihanê ye ku Evro jî tê bikar anîn. Miratek mezin ya dîrokîya ku li vî bajarê Kurdan yê Bakurê Kurdistanê hatiye avakirin. Navê wê Pîreya Kurdî Gendêre ye. Navê xwe jî Çemê "Gendê" digre. Rê wek derbaze Pîre bikar anîne û bûye Gendêrê. Lê Tirkan guhêrîne û navê Cendere lê kirine. Cendere jî pênasayekî gelek bê wete ye. Çemê Gindê yanî Çemê di nav Gindan de derbaz dibe. Nav çiyayên biçûk (tepe) de derbaz dibe. Yanî Bi Weteya "Gindê Rê": Bi zimanê kurdi dema li ser çemê re piyade derbaz dibin dibêjin: "Li ser Gendêr here..." Di nav demê de hatiye kin kirin ku koka Gindêrê jî çûnê, derbaz bûnê hatiye yanî "Here" dest nişan dîke. Ev Pîre di çîhek stratejîk ya bazirganiyê de hatiye avakirin ku bajarê antîk Perî jî, li heman deverê ye. Ev Dever herêma Desthilata Melîkiyaya Komageneya Kurdî bûye. Pîr, di serdema Roma de hatiye avakirin. Lê ji ber ku rêyek bazirgani bûye dîroka xwe digehîne serdema Hîttîtan. Serdema Împaratoriya Roma de ev pîr hate nûjen (193-211) kirin. Paşê navê wê kirin Pîra Septîmîus Severos. Ev Pîre: - Li Ser 2 kemberan hatiye avakirin. -7 Metre Ferehe -30 Metre Bilînde - 120m Dirêje - Duyem pîra mezine ku di Serdema Roma de hatiye avakirin. - Pîre bi kevirên birî ve û bê xerç hatiye avakirin. Taybetmendîya Pîra Ginderê, xerç bikar ne anîne û bi şewazeke sade avakirine. Di herdu serên Pîreyê bi hev re hatiye girêdan û nîveka wê wek kendalekê bestane. Pîre wisa avakirine ku li hemberî bûyerên xwezayî, karasat, erdhejan xwe rabigre. Pîra Dîrokî, 55 km ji navenda bajarê Semsurê dûre. 2 Qezayên Bajarên Semsurê Kolik û

Sincik ê bi hev ve girê dide. Ev Pîreye hem ji aliyê hendesê, amirên bikar anîne û şekil û şemala ve wek ya Pîra Delal ya Zaxo ye. Dema mirov van herdu pîreyan Rû bi Rû dîke. Dibîne ku ya heman serdemê ye û weke ku heman hostay dursit kiriye, hizir dîke. Hem cografîya Devera Zaxo hem jî cografîya devera Semsorê gelek dişibe hev û din. Çemê Ginderê jî hem mezinahî hem jî hecma va dişibe çemê Xabîrî. Pîra Ginderê: 120m dirêje Pîra Delal 115m bilinde Pîra Ginderê: 7m Metre Ferehe Pîra Delal 5 m bilinde Pîra Ginderê: 30 Metre bilinde Pîra Pîreyan kirine.

Delal 16m bilinde Di navbera Pîra Ginderê û Pîra delal de bes 2 cewazi hene. Ev jî Pîra Delal çavkaniyek zanistî li ser avakirina wê re heşt ser ne hatiye peyda kirin. Bes got gotên devkîne ku wek ku dema Ebasiyan de hatiye çêkirin. Lê ev ne raste. Ji ber ku hendeseya wê şewazê Kurdî-Romai ye. Lê Cewaziya li ser Pîreya Ginderê ewe ku bi latîni kîtabek li ser Pîrê hatiye nivîsin ku piştrastiya Serdema Împaratora Roma ye. Her wiha bi zimanê latîni ser keviran hatiye destnişan kirin ku Împaratoru Roma Septîmîus Severos ev pîre (193-211) jiber xatira Kurên xwe û Jina xwe avakirîye. Li Ser Derbazeyên Pîreyê 4 Stunên bilind aliye Sincikê hatine saz kirin ku wek xelat diyarî Kurên Xwe, Stunên layanê Kolikê jî ber xatira Hevjîna xwe avakirine. Di nav demê de 2 stûn hatine xera kirin û evro bes 2 stunên Hevjîn ê mane. Pîra Ginderê piştî Împarator Septîmîus Severos dimire desthilatdariyê radestî her du Kurên xwe Caracalla û Geta yî dîke. Geta Birayê xwe Carasalla ber çavê dayika xwe sere wî jêdike û desthilatdariyê dixwe destê xwe û bi tenê bûye Serokê Împaratoriya Roma. Dema layangirên Birayê wî cilên reş xwe kirin Geta bazar dibe û tevkujiyek mezin encamp dide. Ev pêzanî di pertukên zanistî de jî hatiye piştrast kirin. Ev devera Em qala wê dikin Herêma Melîkiyaya Kurdî ya Komagene ye ku 5 bajarên mezin di bin kontrola wen de bûye. Evro ev Pîre: Heta 5 tenên giraniyê jî dikarin ser re derbaz bibin. Heta îro jî ev Pîra Ginderê wek xwe maye û hatiye parastin. Hatin û çûn jî heta sala 2002ê edî Hikûmeta Tirkîyê biryar stand ku ji bilî giraniya 5 tenan, tirimbêl ser re derbaz nebin û di 500m nêz Pîra Ginderê pîreyek nû avakirine.

## Bi dengê Şêrko Bêkes, helbesta ji bo Rêber Apo nivîsandî

Helbestvanê Kurd Şêrko Bêkes di dema Rêber Apo dîl hatî girtin de ev peyama da bû: "Ev der Silêmanî ye, ev çend roj e xemginiyeke mezin li ser vî bajarî heye. Li ber çavên cihanê Rêber Apo girtin, lê nekarî ruhê Kurdan teslîm bigirin. Amedê çawa ji Silêmaniyê vedqetînin, Newroz çawa bê agir dibe?" Beriya 25 salan Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi Komployek Navneteweyî ku gelek hêz û dewletên hegemon ên cihanê destê wan di nav de hebû, li Kenyayê hate girtin û li Girtîgeha Îmraliyê ya li Girava Îmraliyê hate bi cih kirin. Di dema komploya navnetewî ya li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de, di sala 1999'an de Helbestvanê Kurd



Şêrko Bêkes qesîdeyek li ser Rêber Apo dinivîse. Şêrko Bêkes di peyama xwe de wiha dibêje; "Ev der Silêmani ye, ev çend roj e xemginiyeke mezin li ser vî bajarî heye. Li ber çavên cihanê Rêber Apo girtin, lê nekarî ruhê Kurdan teslîm bigirin. Amedê çawa ji Silêmaniyê vedqetînin, New-

roz çawa bê agir dibe? Gola Wanê çawa dikarin ziwa bikin? Ev der Silêmaniyê ye, hemû dilên vî bajarî wek sêva darekê dilerizin, ji bêkesiya gelekî re xemgîn dibin. Ev xemgîniyeke neteweyî ye, min xewina perperokê dît. Ez digirîm û çavên min li Amedê ye."

Sudoku: Bersiv 58									Sudoku:Pirs 59								
9	2	6	1	7	4	3	5	8			2	3		6	4		1
7	3	5	8	2	6	1	4	9									6
4	8	1	9	3	5	6	2	7			2		9			5	7
3	6	9	5	8	7	2	1	4		8	5						3
8	1	2	4	9	3	7	6	5		6		5		1		2	
5	4	7	2	6	1	9	8	3	7						9	4	
6	9	8	3	4	2	5	7	1	8	2		6		3			
2	5	3	7	1	8	4	9	6	4								
1	7	4	6	5	9	8	3	2	6		1	9		5	8		

## FERHENG A BIWÊJAN

- Ez dikim li te dibare:**  
 - Ez kedê didim, tu sûdê jê digirî
- Ez çi bikim, kurkê min ne sor e:**  
 - Şansê min nîne; ez ne dewlemend im; ji ber xizaniya min qîmet nadin min.
- Feleka wî çep zivirî:**  
 - Bi heman wateyê.
- Felek xayin e:**  
 - Dema karê yekî li hev neyê hingê dibêje.
- Gotin, kûsi tu çima pisî, got, li eniya min nivîsî:**  
 - Ji bo kesên her tim teşeqe tîn serê wan tê gotin.
- Here ser çem wê çem biçike:**  
 - Bêşans e
- Here ser kaniyê wê kani biçike:**  
 - Bi heman wateyê.
- Here ser şet wê şet biçike:**  
 - Bi heman wateyê.
- Bi heman wateyê.  
 - Îro ne roja me ye:  
 - Îro li me nayê; îro şansê me nîne.  
**Ji xelkê re cih û war e ji min re erdê sar e:**  
 - Şansê min nîne; karê min li hev nayê; ji bo her kesî dibe lê ji bo min nabe.  
**Jîr e lêbelê bextkîr e:**  
 - Bêşans e:  
**Keleka wî qulibî:**  
 - Bextê rî reş e.  
**Kewê wî nexwend:**  
 - Şansê wî lê neda.  
**Qirdê me kor bextê me reş:**  
 - Şansê me nîne; karê me li hev nayê.  
**Qenc li me rast nayên, pis li me danayên:**  
 - Dema kesek nikaribe pêwîstiyên xwe pêk bîne; ti kes alîkariyê pê re neke û ew jî xwe muhtacê her kesî neke hingê tê gotin.  
**Sêwî çûn sergînan çêlekê di avê de rîx kir.**  
 - Dema karê yekî li hev neyê, şansê wî tinebe hingê tê gotin.  
**Sipeha wî beloq e:**  
 - Kî çî dîke xuya nake, lê dema ew lişteke nebaş dîke ya wî xuya dîke; kêmayiyên wî nayên veşartin; bextê wî reş e; şansê wî nîne, şeh di serê wî de dişke.  
**Spiya me belîqî:**  
 - Şansê wî lê neda.  
**Stiriya min beloq e:**  
 - Bi heman wateyê.  
**Stêra wî vemirî:**  
 - Kevirê wî qulibî; şansê wî çû; rewşa wî xirab bû.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Birîndara şer, DAIŞ û dewleta Tirk tirsandin: Sorxwîn Rojhilat

Fermandar Sorxwîn Rojhilat 18 salan li dijî zîhnîyeta bavîksalar û kevnepereşt tê koşîya, tirs xişt dilê DAIŞ û dewleta Tirk a dagirker. Fermandar Sorxwîn û Azadî Dêrik di êrişa hewayî ya dewleta Tirk a dagirker a li dijî navenda Federasyona Gaziyan de şehîd bûbûn.R-2



## 'Bi ramanên Rêber Apo ciwan ber bi azadiyê ve dimeşin'

Jinên Ciwan yê Bakur û Rojhilatê Sûriyê anîn ser ziman ku ev 25 sal in ku Rêber Abdullah Ocalan li Îmraliyê li ber xwe dide. Herwiha ciwanên jin dan tekezirin ku ciwanên cihanê bi fikir û felsefeya Rêber Apo ber bi azadiya wî ya fizîkî ve dimeşin.R-5



# PERGALA ÎMRALÎYÊ PERGALA QIRKIRINA GELÊ KURD E

Komploya Navneteweyî ku di 9'ê Cotmeha 1998'an de li dijî Rêber Abdullah Ocalan hat destpêkirin bi diwarî didome. Ev 35 mehî bi ti awayî ji Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tu agahî nayên girtin. Herî dawiyê bi rûdana erdheja Gemlikê fikarên derbarê tenduriştîya Rêberê Gelê Kurd de hê zêdetir bûne. Herwiha hate diyarkirin ku heyeteke CPT'ê di navbera 13-22'ê Sibata 2024'an de ji bo vekolana pêkanînen li ser kesên di girtîgehên ewlekariya bilind de tîn kirin, serdana Tirkîyeyê kir, lê bê ku serdana Îmraliyê bike vegeyriyê û ev yek jî hevkarîya CPT ya bi faşîzma Tirkîyê re dide xuyakirin.R-3



## Di 3'ê salan de HRE 324 çalakîyên bibandor li dar xistine

Hêzên Rizgariya Efrînê bilancoya çalakîyên ku li dijî dagirkeriya Tirk û çeteyên wê li dar xistinê yê di navbera salên 2020 heyanî 2023'an de ragihandin. HRE'ê da xuyakirin ku hêzên wan di nava 3'ê salan de 324 çalakîyên bibandor li dar xistinê.R-3



## 'Şaredariyên demokratîk ji bo xizmeta gelan e'

Hevserokê Desteya Rêveberîya Xwecihî ya Kantona Cizîrê Silêman Ereb diyar kir ku li gorî hevpeymanî civakê xebatên şaredariyê wê birêve biçin û got; Şaredariyên demokratîk wê ji bo xizmeta gelan bibê cihê çareseriyê.R-6

## 'Jina şoreşger keziyên azadiyê dirêse'



9'emîn festîvala Wêje û Hunerê ya Jinan ku wê di 1 û 2 Adarê de bê lidarxistin, amadekariyên pêşwazîkirina nivîskar û hunermendên jin dike, da ku deng û rengê jinê diyar bike.R-7

# Birîndara şer, DAIŞ û dewleta Tirk tirsandin: Sorwîn Rojhilat

Fermandar Sorxwîn Rojhilat 18 salan li dijî zîhniyeta baviksalar û kevneperestê têkoşiya, tirs xist dilê DAIŞ û dewleta Tirk a dagirker. Fermandar Sorxwîn û Azadî Dêrik di êrişa hewayî ya dewleta Tirk a dagirker a li dijî navenda Federasyona Gaziyana de şehîd bûbûn.

Xaka Kurdistanê bi xwîna pîroz a jinên li dijî sûcên qirkirina fikrî û fizîkî ya jinan pêk tînin, hate avdan. Şehîd Sorxwîn yek ji hezaran şehîdan e ku nûneriya tevgera azadiya jinan kiriyê û li ser şopa hevreyên xwe heta dawiyê meşiyaye. Sorxwîn Rojhilat sala 1985'an li gundê Girîkê yê bajarê Mako yê Rojhilatê Kurdistanê.

Sorxwîn ji malbateke welatparêz a ji eşîra Celalîyan e. Eşîra Celalîyan li hember dagirkeran serî hilda. Herwiha ji warê serhildêran Şêrin Elmeholî û Zeyneb Celalîyan e yên ku li hember zîhniyeta baviksalariyê li ber xwe dane.

Sorxwîn ji biçûkaniya xwe de Tevergera Azadiya Kurdistanê nas kir û ji ber siyasetên dagirkeran Kurdistanê û zilma li ser jinan di 2006'an de

tevlî têkoşîna tevgerê bû. Sorxwîn li Akademiyên Şehîd Bêrîtan û ya Şehîd Zîlan perwerde dît û xwe li gor qonaxê pêş xist. Çiyayên Rojhilat, Qendîl, Botan, deşta Rojavayê Kurdistanê û kolanên Kobanê şahidê têkoşîna wê ne. Di 2014'an de dema ku hovîtiya DAIŞê li Kobanê gihîşt asta herî bilind, jinên Bakur, Başûr û Rojhilatê Kurdistanê berê xwe dan Kobanê û destanên lehengiyê nivîsandin.

Fermandar Sorxwîn bi rêya taktîkên xwe yên li dijî DAIŞê tirs xist dilê dijminan û bû pêşenga berxwedana Kobanê. Di berxwedana xwe ya li hember DAIŞê de birîndar bû lê tevî birîna xwe û jîdestdayîna ronîya çavê xwe jî, berxwedana xwe ya dirokî li Kobanê domand. Li vê dawiyê fermandar Sorxwîn li navenda Gaziyên Şer



a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dima, ji bo tevahî hevriyên xwe yên gazî bû çavkaniya coş û kelecane. Di 11'ê Sibatê de dewleta Tirk a dagirker bi balafirkeke bêmirov êrişî avahiya Federasyona Gaziyana Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ya li Qamişlo kir. Di encamê de herdû fermandar Sorxwîn Rojhilat û Azadî Dêrik şehîd

bûn. Cenazeyê şehîd Sorxwîn li Pakrewangeha Şehîd Dicle ya li bajarê Kobanê li ser wesiyyeta wê hat veşartin. Cenazeyê fermandar Azadî Dêrik jî li Goristana Şehîd Xebat û Rojhilatê Sûriyeyê ya li Qamişlo kir. Di encamê de herdû fermandar Sorxwîn Rojhilat û Azadî Dêrik şehîd

## Ramangeh

Yê min nas neke, ez jî wî nas nakim

Zozan Cizîrî

21'ê Sibatê Roja Zimanê Dayîkê ya Cihani isal ji li piraniya bajarên Kurdistanê bi çalakîyên cur bi cur ên girseyî hat pîrozkirin. Di hemû daxuyanîyan de gelê Kurd israra xwe ya ji bo paraştina zimanê kurdî eşkere kir. Her wisa dawaxza ku divê êdî zimanê kurdî ji aliya dewletan ve wek zimanek fermî were naskirin destnîşan kirin. Pir balkêş e îro ji 40 milyonan zêdetir insanên Kurd bi zimanê Kurdî diaxivin. Lê wekî dewletên ku welatê me Kurdistan dagir kirine dewleta Sûriyê, Tirkiyê û Iranê hîna zimanê kurdî wek zimanê gelekî fermî nepejirandin. Di dibistanên girêdayî van dewletan de mafê tu Kurdêkî/ê nîn e bi zimanê xwe yê dayîkê biaxive û bixwîne. Ji bo wê siyaseta qirkirin û bişaftinê sed sal in bi rêbazên dijminane li ser ziman, çand, nasname û giştî hebûna gelê Kurd ferz dikin. Belê hêzêke ku zimanê te qebûl neke, bêrêziya herî mezin destpêkê li hemberî dayika te dike. U kî dikare qebûl bike ku hinek bêrêziyê li hemberî dayika wî/wê bikin? Li vir hejra ye mirov kevanekekê veke û pendeke balkêş a mamoşteyê nemir Mûsa Enter destnîşan bike. Di dagheha dewleta Tirk de Apê Mûsa wek zanyarekî Kurdperwer û bi xwe bawer li hemberî pirseke dozger dibêje, "Eger zimanê min ê dayîkê himên dewleta te dihejîne, te wateya te dewleta xwe li ser zewiya min lê kiriyê!" Bi vî awayî Ew sistema daraza dewleta Tirk bêmînet dike, dixe ber lêpirsînê û pûç dike.

Fikra ku em ji dersdarê xwe yê mezin Apê Mûsa digirin; hebûna Kurd û Kurdistanê heqçetake civakî ye û nabe were înkarkirin. Gelê Kurd hîn navê yek ji van dewletên mijara gotinê jî nebû, her hebû û wê her hebe. Mirov ku bi zimanê xwe yê dayîkê bixwîne, binivîse û fêrî zanîsta xwe ya civakî bibe, mafekî herî rewa yê însani ye. Helwesteke exlaqî û civakî ye. Ev maf çawa ji bo her gelekî derbasdar e, ji bo me Kurdan hîn zêde derbasdar e. Di vê wateyê de girîng e em vê carê berê pîrsên xwe biguherin û wek helwesteke civakî bibêjin, "ew dewleta min nas nake, ez çima wê nas bikim!" Jixwe yek ji van dewletên dagirker ên li ser erdên Kurdistanê, li xwestekê di erêkirina gelê Kurd nehatiye damezrandin. Wê çaxê destpêkê hebûna van dewletan a li ser erdê Kurdistanê ne rewya ye, ne ji fermî ye û ji nîqaşê re vekiriyê.

Ji bo wê sert e her Kurdek mala xwe bike dibistan û ji dewletan bêmînet zarokên xwe bi zimanê xwe yê dayîkê perwerde bike. Ango her malek divê bibe dibîstaneke dayîkê û wê rolê herî zêde jin û dayîk dikarin pêk binin. Elbet sazî, mamoşte û kedkarên zimanê kurdî wê cardin hewl bidin zimanê kurdî li ser asta cihanê bikin zimanek fermî. Lê ji bo wê sert e malbat destpêkê ji bo rûmet û kerameta xwe ya civakî qîma xwe pê neynin ku zarokên xwe li ber deriyê dibîstanên sistema dagirkeriyê bigerin.

# ‘Jina şoreşger keziyên azadiyê dirêse’

9'emîn festîvala Wêje û Hunerê ya Jinan ku wê di 1 û 2 Adarê de bê li darxistin, amadekariyên pêşwazîkirina nivîskar û hunermendên jin dike, da ku deng û rengê jinê diyar bike.

## Bîrûc Resûl/Qamişlo

Li Kantona Cizîrê amadekariyên lidarxistina 9'emîn festîvala Wêje û Hunera Jinê tên kirin. Festîvala ku salê carekê ji aliya Desteya Çandê ya Kanton Cizîrê ve bi hevkarîya Tevgara Çand ya Hîlala Zêrîn tê organizekirin, wê isal di 1 û 2'ê Adarê de bê li darxistin. Festîvala Wêje û Hunera Jinê cara yekemîn di sala 2015'an de hat lidarxistin û her sal bi naverokek dewlemendtir tê lidarxistin. Her wiha isal wê festîval bi dirûşmeya 'Jina Şoreşger Keziyên Azadiyê Dirêse' li Navenda Çand û Hunerê ya Mihe-mez Şêxo ya li Qamişlo were li darxistin. Bi armanca xurtkirina girêdana hemehengiyê di navbera hemû jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de, wê her jin li bi çand û rengê xwe yên taybet beşdar bibe. Herwiha wê keda jina perwerdekîrî û nivîskar jî bê ronî kirin. Festîvala Wêje û Hunerê ya jinan wê belê dergoş û bingeha pêşxistina jinê. Di derbarê amadekariyên lidarxistina festîvala Huner û Wêjeya jin berdevka Dîwana Wêjeyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Narîman Evdikê û kordinasiyona Hîlala Zêrîn a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Mizgîn Çolaq ji Rojnemaya me re axivîn. Narîman Evdikê wiha dest bi axaftina xwe kir: "Serlêdanên ji bo beşdarbûna festîvalê di meha çile de dest pê kir û wê 20'e Sibatê de bidawî bibin. Festîval li kantona Cizîrê wê bê li-



Narîman Evdikê



Mizgîn Çolaq

tabloyên herî balkêş û berhemên herî xurt, wê di roja 2'emîn de ji aliya tevli festîvalê bibin. Kesên ku dixwazin tevli bibin wê karibin berhemên xwe bi zimanê Kurdî, Erebî û Suryanî pêşkêş bikin. Nirxandina berheman jî wê li ser her sê zimanan çêbibe. Em di 9'emîn festîvala çand û hunera jinê de cihê xwe wekî komîteya amedkar digirin, ev demeke baş em hazirtî û amadekariya festîvalê dikin. Wekî te zanîn ku beşê di nava festîvalê de xwe digire, wêje, huner, çand, şewekarî, çirok, helbest û gotarên wêjeyî, her wiha kesên ku tevli bibin jî wê modêyên temenê wan di ser 18'ê safî de. Em ê heya 20'ê miha Sibatê berheman û tabiloyên şewekariyê bigirin."

## Bernameya festîvalê

Berdevka Dîwana Wêjeyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Narîman Evdikê di dawîya axaftina xwe de da zanîn ku festîvala wêje û hunera jin isal wê berferhtir be û wiha got: "Bernameya festîvalê wê isal bi tiştên nû û cuda wê were li darxistin. Bi hatina miha Adarê ku bi miha jinê tê naskirin, me

## Pêşandana cil û bergên kurdî

Narîman balkişand li ser komîteya nerxandinê û wiha got: "Di her 2 rojên festîvalê de, wê berhem û tabiloyên şewekariyê werin pêşkêşkirin, li gorî

# Helbestvana şehîdan a dilsoj; Hesîna Ehmed

## Hemza Sêvo/ Qamişlo

Helbestvana kurd Hesîna Ehmed bi rihekkî şoreşgerî û bi dilekî şewat ji destpêka şoreşa Rojava ve xwe fêrî zimanê kurdî kir, bi hestdarî û hez-kirineke mezrin raştiyê pênuşê û bi dehan malik li ser şehîdan û gelê kurd hûnandiye.

Nivîsîna helbestê bi awayekî giştî hestekî tenik û xeyalkî berfêreh diwaxze, kesê/a helbestvan jî bi behreya xwe û bi palpiş-tiya hest, xeyalên xwe, peyv û ramanên watedar malikên zêrîn dihunîne. Ji ber ku jin di xwezaya xwe de xwedîya hestên nazik e, ger pênuşa xwe bi kar bine wê afrineriya xwe derxîne holê. Nexasim ku jina kurd ragira pênuşa nivîsîna helbestê be û bi zimanê dayîkê hestên xwe bine ser ziman. Li Rojava ji ber zexta qedexekirina hikumeta Şamê ya berî şoreşa 19'ê Tirmehê û bû sedema ku gelê kurd di di nav de jinên kurd jî hemû mafê xwe biminin. Piştî şoreşa 19'ê Tirmehê êdî jinan bi vîna xwe de hemû waran de xwe dan tekezirin. Yek ji van jinan berxwedêr jî helbetvana kurd, Hesîna Ehmed e. Hesîna Ehmed li nik ku bi dehan helbest nivîsandine û diwaneke de wiha dest nîşan kir: "Ji ber ku em weke gelê kurd jî zimanê xwe mehrûm mabûn û xwendina tîp, sirûdeke bi kurdî cihê şadeweriyê bû. Gelê kurd di bin zexteke pir mezin a hukûmeta Şamê û destlêdariyaya wê de bû. Piştî girûska azadiyê ya şoreşa Rojava veket û ala kesk û sor û zer li asmanê bajarên kurdan li ber ba ket. Piştî ewqas zexta mezin êdî derfeta kurdan çêbû û wê derbirin û hestên xwe binin ser ziman.

## Jiyan û xwendin

Hesîna Ehmed di derbarê jiyan û xwen-

dina xwe de, wiha anî ser ziman: " Ez di sala 1975'an de, li gundê Teilkê yê girêdayî bajarê Qamişlo ji dayîk bûme. Min ji seretayî heya amadeyî bi giştî li dibistanên Qamişlo xwendiyê. Sedem jî ev yekê jî ji ber ku gundê me gelekî biçûk bû û dibistan jî lê tunebû. Ji neçarî jî ez û xuşkên xwe hatin bajarê Qamişlo û li mala kalikê xwe me dest bi xwendina xwe kir. Herwiha piştî wê bi demekê bavê min malek li Hililîyê kirî û ez û xuşkên xwe tê de bi cih bûn û me xwendina xwe berdewam kir. Piştî ku bavê min di sala 1988'an de çû ser dilovaniya Xwedê, êdî em bi malbatî hatin Qamişlo û li mala xwe ya li taxa Hililîyê bi cih bûn. Êdî min bawernameya amadeyî ya erebî bi beşê wêjeyî bi dawî kir û piştê ez di temenê 18 salî de zewcim. Ji ber zewacê û karê malê min xwendina xwe ya erebî berdewam nekir. Lê piştî demeke dirêj û bi destpêkirina şoreşa Rojava re min dest bi nivîsîna helbestê kir. Di heman demê de, di sala 2014'an de Yekîtiya Rewşenbîrên Kantona Cizîrê hate damezrandin û ez weke endam tevli wê bûm."

## Berhemên wê

Helbestvana jin Hesîna girêdayî berhem û gotarên xwe jî wiha axivî: "Yekem helbesta ku min nivîsand, li ser şehîdan bû, lewma min navê dîwana xwe kir Wa Şehîd. Herwiha min ev dîwan bi rêzbandî û awayê nûjen helbestên xew hûnandin. Dibe ku dîwana min a bi navê Wa Şehîd kêmasî di warê asta xeyal û nivîsînê de hebin. Lê dîsa ew helbestên min gavên destpêkê bûn jî nivîsîna helbestê û aliya wê yê wêjeyî hinekî lawaz bû. Li aliya din jî bi rastî terzê nivîsîna kilasîk bi min gelekî zehmet bû, gîha astekê ku min hevî û omîd jî fêrbûna helbestên bi rêzband û kevnara kurdî kir. Lê bi saya piştişgîriya hevjinê xwe ku ew jî helbestvan û nivîskar e, herwiha mamostê xwe Salihê Heydo, ez fêrî kilasîkiyeta helbestê bûm. Bi xwendina azadiyê ya şoreşa Rojava veket û ala kesk û sor û zer li asmanê bajarên kurdan li ber ba ket. Piştî ewqas zexta mezin êdî derfeta kurdan çêbû û wê xwerû bi terzê kilasîk û asteke wêjeyî



Fêrbûna zimanê kurdî

Helbestvana jin têkildarî fêrbûna zimanê kurdî wiha got: "Bi destpêkirina şoreşa Rojava Ore êdî li Rojava gelê kurd vejîn da. Di wê demê de evîneke mezin ji şoreşê re hat dayîn, ji ber ku bi şoreşê re azadiya gelê kurd hat çûrosandin. Ez jî bi hezkirin û xwestekeke pir mezin tevli xebata rewşenbîrî bûm û min xwe fêrî zimanê kurdî kir. Fêrbûna min ji zimanê kurdî re jî bi rîya astên zimanê kurdî yên ku li nav taxan dihatin dayîn bû. Min di wê demê de 3 astên kurdî bi dawî kirin. Di odeyêke biçûk de ji hejmara xwendekaran re tê de tunebû ku piraniya şagirtan jî jinên bi temen mezin bûn, me waneyên ziman dîftin. Fêrbûna kurdî di wan astan de ji bo me serkeftina herî mezin bû. Di destpêka de jî ber ku min nizanibû bi kurdîya latînî binivîsinim, min helbestên kurdî bi tîpên latînî divîsandin û piştî ku ez fêrî latînî bûm, min helbestên xwe veguherandin kurdîya latînî.

## Ciwan û Medya Civakî



Sîpan Şînda

Civak û pêdiviyên civakê her tim li gorî demê têne guhertin. Di heyamên berê de, guhertin li gorî iro gelekî hêdîtir çêdibî û bandora wê ya li ser civakê jî ne bi qasî guhertinên iro bû. Tiwibê wan guhertinan li gorî yên iro tengtir bû û bandora wan jî siviktir bû.

Di heyamên berê de civak jî bo guhertinan ne amade bûn. Dema guhertinek çêdibû, yan jî tiştek nû derdiket civak li himberî wê sa-qis diman û gelek jî li himberî wê tişta nû disekinrin. Qebûl nedikirin. Lê îro him dewran, him jî meji û mentallta civakê hatiye guhertin û jî ber wê tiştên nû wan gelekê şaqis mayî nahele. Her çend mirov jê fêm jî nekine, lê belê nerazibûna wan cudatir e nemtir e. Ev jî bi saya serê xwendinê û teknolojiya pêşkêti ye. Asta teknolojiya iro gihayiyê, astekî gelekî bilind e û tiştên nû derdikêvine jî, di heman demê de xwe digihinim hemî deverên gerdîne. Îcar di nav civakê de ji hinek beş hene jî guhertinan re vekirîtin û guhertinên nû zûtir dihevinin û pîtir di bin bandora wan guhertinan de dimînine. Gelo niha yek jî wê bipirse û bêje di roja me de tişta herî zêde bandorê li ser ciwanan dike çiyê, hûnê çî bersivê bidîne? Bê goman hûnê nebêjîne di û bavîn, newe! Jan ji mamoşte û heval û hogir in. Heke hûn bêjîne dûtûbab in, wê ciwan kenê xwe li we bikine. Ji ber ku tişta iro herî zêde bandorê li ser ciwanan dike, teknolojî ye û girêdayî wê jî medya civakî ye. Îro teknolojî bûye perçeyek yê jîyana me. Heta gelek kes hene ku êdî girêdayî wê bûne û jî bêyî wê nikarinê bişîne. Dema telefona wan ya deştan ne li deştan wan de be, hedar û tebatan wan nayê û tu dibêji qey wan mejiyê xwe wînda kiriyê. Ya rast teknolojiyê mejiyê civakê jî kor kiriyê. Bi taybetî jî nivşên nû bûne êxsrîte teknolojiyê. Ewqasî girêdayî teknolojiyê bûne, dema dûtûbabê wan yan jî hinekî din gazî wan dikine, êdî demê wan jî nabihîsîne. Dûtûbabê wan deh tiştan jî wan re dibêjîne, lê hawa wan jê nîne. Heta dikarin tiştêkê li wan bidine kirin, bezê çawa wan sor dibe. Di rê de diçêne nafekine peşîya xwe, jiber ku qavên wan li telefona wan de ye. Medyayên civakê yê wê Instagramê, facebookê, Xê, tîktokê, snapchatê bûne cihê civat û hevdiîtina wan. Ew êdî her tiştê xwe jî wêdî dişopînin, xwe li wan platforman de dibînin. Çi tişta dikine hema cih de di platforman de bar dikine û bi "şopînerên" xwe re parve dikî-ne; û keyfêke gelekî mezin jî jî vê diştînine. Heta wêlê lê hatiye, dema yek pîrsekê jî yekê dike, dibêje feke Instagrama min û min bişopîne tê bizanî. Belê mixabîn ev platformê nemê êdî bûne cihê bazirganîyê jî. Gelek kes di wan platforman de diravan qezene dikine. Heta gelek kesan êdî tiwibên exlaq û etîkê jî çirandine û ev platform kirine cihê pêşengeha laşê xwe. Jixwe eva hene bi taybetî mijarîk etî û felsefeyê ye ku li ser biponijî û analîzan bikin. Belê, îro ciwan heta zarok jî ketîne di wan pencevî teknolojî û medya civakî de. Bi taybetî jî nivşên di navbera 13-25 salî de êdî bûne êxsrîte medya civakî. Heta temenê beşîr jî de. Dûtûbab jî di vî warê de gelekî xemars in û di peyriwa xwe nayîne cih. Bê goman ev qunek jî wê mijarê re teng e û têrê nake. Lê belê min xwest hema hişyarîyek kiçîk be jî, ez vê binime bîra we.

# Çîroka serkeftinê ya du jinên ciwan

Zahraa Hatem Qamh û Rayan Îsmail yên ku xwedî pêwîstiyên taybetin di qadên cuda de astengîyan derbas dikin û serkeftinan bi dest dixin.

Zahraa Hatem Qamh û Rayan Îsmail yên ku xwedî pêwîstiyên taybet in rûxmê pîrsîrêkên tendirûstiyê jî dixwazin di her qada jîyanê de kar bikin. Her du jinên ciwan ên ku bi tevgerêk kêr serkeftinek girîng bi dest xistin, ev bang li jin û zarokên keç dikin: "Li tiştên ku hûn jê hez dikin bigerin, ne li karê ku ji we re tê pêşniyar kirin an pêşkêş kirin û hewl bidin ku bigihîjin tiştê ku we kêfxweş dike."

## Ji roja dayikbûnê ve li hemberî nexweşiyê têdikoşe

Zehraa Hatem Qamh a 31 salî ji bajarokê Kferhîlî yê navçeya Sidonê li başûrê Libnanê, ji ber pîrsîrêkên dayika xwe bi sezaryanê hatiye dinê. Zehraa Hatem Qamh a ku dema tê dinê bi zerîkê ketiye, li gorî dayika wê dibêje destwerdana dereng a bijîjkî bûye sedem ku nexweşîya serebral palsî (felca mêjî) derbas bike. Zehraa Hatem Qamh piştî ji dayikbûnê rastî gelek pîrsîrêkên tenduristiyê, wek nexweşiyên pêşketinê, astengkirina tevgerê, çelsîya masûlkan, bihîstin û axaftinê hatiye.

## Di teşhîskirinê de dereng mane

Dayika Zehraa Hatem Qamh, Olfat Qamh got: "Dema zaroka min hat dinê min metirsiyê xwe jî bijîjk re got lê bijîjk diyar kir ku tîrsa wê jî ber hestan pêş dîke-ve di encam de teşhîskirinê de dereng ma. Zahraa hîn sala xwe xelas nekir min ve bir cem norolojî. Piştî teşhîskirina norolojî me dest bi tedawiyê kir. Berî ku ew bigihêje temenê dibistanê, min ew amade kir li Komelêya Hevgirtin û Pêşketinê biçû dibistana kesên xwedî pêwîstiyên taybet. Piştê, min ew şand



Beşa Astengdarên Fêrbûna Dibistana Hossam Eddîne Herîrî. Zahraa perwerdeya xwe xelas kir û dest bi pîsporiya pişeyî kir. Keça min Zahraa hezkirinek mezin nîşanî werzîş û hunerên destan dida lê dibistana ku lê dixwend ev derfet nîn bû. Piştê min yek ji mamosteyên werzîşê Rahêner Îman Sabbagh nas kir. ew li zarokên xwedî pêdiviyên taybet xwedî derdiketin û wan di bikaranîna kursiyên bi teker de perwerde dikir."

## 'Werzîş min kêfxweş dike'

Zehraa Hatem Qamh serpêhatiya xwe bi wan gotinan anî ser ziman: "Destpêkê min nizanibû ez çî dixwazim û min dixwest, bi her werzîşê re bimeşim heya ku min mamosteyê werzîşê Îman Sabbagh nas kir, ku rêberiya min kir û min perwerde kir di lîstoka bocce de, lîstîkek ku bi topên hesinî tê lîstin. Lîstîka bocce xwedan dîrokekê dirêj e. Lîstîkek hêsan e, pîvana diyarî û hismendiyê hildigîre. Ji bilî atletîzm û bazdanê, ez di heman demê de tûrnûva û basketbolê jî dilîzim. Ez beşdarî tûrnûvayên werzîşê yên li ser asta herêmi li Beyrûdê û herêman dinor bûm. Werzîş min kêfxweş dike."

## Li hember nexweşiyê têk neçû

Rayan Îsmail a 26 salî ku ji bajarokê Însar

me hene ku ji xewn û armancên kesên din mezintir in. Lê belê ji ber pîrsîrêkên min ên tenduristiyê di perwerdehiyê derketin. Min bi tenê dikarî heta pola dehemin bixwînim. Vê yekê şansên min ên peydakirina kar asteng kir. Dema ku min hunera Makrome li ser medyaya dijîtal dît, bala min kişand û min biryar da ku ez fêrî wê bikim. Li rastî jî wisa bû û ez bi temaşekirinê fêrî wê hunerê bûm, bêyî ku tu perwerdeyê bibînim."

## Ew jî bo xebatê bê parzûn kirin

Rayan Îsmail destnîşan kir ku di Cot-meha 2021'an de dest bi projeya xwe kiriyê û got: "Karê min jî aliya xizm û hevalên min ve hat ecibandin. Hewl-dana min bextewariyêke bêhempa da min. Niha fîrotina min hewcdariyên min pêk tîne. Mişteriyên min jî beşên cuda yên civakê pêk tên. Ji Libnan, Kuweyt û Afrîkayê mişteriyên min hene. Ji bo formekî hûnerî ya estetîkê bê destxistin, hûnandina ta yek ji hunerên girîng ya çanda Ereban e."

## 'Hewl bidin ku bigihîjin tiştê ku we têr dike'

Rayan Îsmail peyama xwe jî bo jin û keçan parve kir û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Berî her tiştî li karê ku hûn jê hez dikin bigerin, ne li karê ku tê pêşniyarîkirin û pêşkêşî we tê kirin û hewl bidin ku bigihîjin tiştê ku we têr dike. Ji ber ku hewesa ji bo tiştê ku em jê hez dikin rîya me ya afirînerî û serfiraziyê ya duyemîn jî em bala xwe bidin serkeftina akademîk, jî ber ku perwerdehiya domdar jî bo zarokek keç girîng e. Ger ew ne pêkan be nehelên ku ev mijar bibe asteng. Ji ber ku hûn dikarin bigihîjin karê ku hûn jê hez dikin ku hûn tê de serfiraz, serxwebûn û azweriyên we têr dike. Tecrûbeyên ku min di vê dema kurt de berhev kirin hişt ku ez hîn bêhtir ji xwe bawer bim."

# ‘Dosiya windayan û diyarkirina çarenûsa wan mijareke mirovî ye’

Rêveberiya Xweser komîteyeke taybet ji bo dîtin û diyarkirina çarenûsa kesên winda damezirand. Girêdayî kar û xebata vê komîteyê, berdevkê Komîta Windayan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Xalid Umer da zanin ku mijara windayên pêkhateyên Sûriyê û diyarkirina çarenûsa wan, mijareke mirovî û yasayî ye. Herwiha Umer got, diyarkirina çarenûsa windayan, mijareke zehmet e û ji bo xebata me jî pêwîstî bi piştgirya navnetewî heye.

## Reşo Mihemed/ Qamişlo

Rêveberiya Xweserîya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê di 29'ê Tebaxa sala 2023'an de girêdayî biryargirtina navnetewî ya Neteweyên Yekbûyî, li ser damzrandina Komîta Windayan da erêkirin.



Ev komîte jî mijûldarî pîrsa kesên ku di encama kirîza Sûriyê, şer û pevçûnê rûdabûn de windabûne, dibe. Komîta Windayan bi armanca vedîtina kesên winda, di 10'ê Sibatê de weke yekem gav li ser asta kantona Cîrîrê dest bi karê xwe kir. Êdî malbatên kesên windayî rojên navendî û sêşeman dikarin serdana navendên erkdar bikin û agahiyan wan kesên winda bidin navendan. Herwiha têkildarî avabûn, kar û xebata Komîta Windayan, berdevkê komîteyê Xalid Umer ji rojnameya me re axivî.

## Armanca ji damezrandina Komîteyê

Umer têkildarî mebesta avabûna

herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, yên çarenûs û cihê wan ne diyar e û her kesê biyanî ku li herêma wenda bûye, winda ne. Bi şertê ku sedema windabûna wan di encama şerê çekdarî û rewşa bêewlehiyê de be. ”

## Kar û xebata Komîteyê

Umer di derbarê kar û xebata komîta Windayan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê de wiha axivî: “xebatên komîteyê di destpêkê de wê di warê berhevkirina dane û agahiyan de şinordar be. Pîrsa lêgerîna kesên winda ne ewqasî hêsan e weke tê texmînkirin. Di dema niha de çarçoveya kar û xebatê li ser asta kantona Cizîrê ye û di demeke nêz de wê navendên me li ser asta hemû kantonên din werin amadekirin. Xebata lêgerîna li kesên winda wê bi tevkerîna hemû saziyên Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê were kirin. Herwiha em ê hewil bidin ku derbasî zindanên hikûmeta Şamê bibin.

## Astengi

Berdevkê Komîteya Kesên Windayî Xalid Umer girêdayî astengiyên ku derdikevin pêşiya kar û xebata Komîteyê wiha da destnîşankirin: “ Di pêvajoya duymem jî xebata me de lêgerîna li kesê winda tê destpêkirin. Lê hin astengi der-

